Newroz Hejmar (76) Rûpel (12) Ç. Pêşîn 2007z – 2619k

15 e mîn salvegera Şehîdbûna Mûsa Anter

***Rêberê Silîvî**

Sala 1918 an, li gundê **Zivingê**, navçeya **Nisêbînê** li bakurê kurdistanê, **Mûsa Anter** ji dayik dibe, xwendina xwe ya seretayî li **Mêrdînê,** ya navendî û lîse li **Adanayê** diqedîne. Sala 1941 ê, ji bo xwendinê, berê xwe dide **Sitenbolê**, fakulta maf(hiqûqê) diqedîne. Di sala 1944 an de, keçeke kurd ji xwe re tîne, du kur û keçek ji wan re çêdibin, wan bi **Anter, Dicle** û **Rewşen** bi nav dikin.

Mûsa Anter, xortekî zîrek û jêhatî bû, xwîna kurdayetiyê di hiş û damarên wî de bi xurtî digeriya, têkoşîn ji bo azadiya kurd û kurdistanê armanca wî ya sereke bû. Ji bo vê armanca pîroz, di demên havînê de, ew derbasî binxetê dibû, bi kesayetiyên welatparêz re yên mîna **Kamîran Bedirxan, Osman Sebrî, Haco Axa, Emînê Ehmed**…hwd re hevaltî û dostanî daniye û bi hev re, komela rizgarkirina kurdistanê damezirandine. Ji bilî xebata rêzanî(siyasî) û ji ber giringiya rola zimên di xebata netewî de, **Mûsa Anter**, guhdaneke baş li zimanê kurdî kiriye, gelek pirtûk û gotar pê weşandine, ji wan: **Birîna Reş**(şano), **Ferhenga kurdî**, **Çinara min**, **Qimil**… û ji ber gotar û nivîsên xwe, pir caran ketiye zindanê, lê, tu carî, zindanê çavên wî ne şikandiye û xebata wî sist ne kiriye, bîr û baweriyên wî ne hejandine, her û her ew li ser rêya xebata netewî birêve çûye. Apî Mûsa, pirtûka xwe Birîna Reş di zindanê de nivîsandiye û ferhenga kurdî-tirkî ji 8000 peyvan amade dike.

Di destpêka salên 1960î de, ew di nava partiyên çep ên tirk de xebatê dike, di sala 1971 an de careke din ew tê girtin, sala 1976 an tê berdan, berê xwe dide gundê xwe heta sala 1989 an lê rûdine, sala 1989 an, dîsa berê xwe dide bajarê **Sitenbolê**, di gelek kovar û rojnameyan de dinivîse û dibe endamê partiya HEP ê ya legal. Roja 20ê Îlûna sala 1992 an, li Amedê, ji hêla hêzên ewlekariya dewleta tirkan ve tê kuştin û tevlî kerwanê şehîdên kurdistanê dibe, doza wî weke dozeke kujerê wê ne diyar tê qeydkirin.

Apê Mûsa, mirovekî hişmend, rewşenbîr û siyasetvan bû, di kêlîkên teng û dijwar de, giran û dûrbîn bû, peyvên wî pîvayî bûn, li hember neyarên gelê xwe bersivên wî herdem li ser lêvên wî bûn, bi tinaz û aqilmendî li wan vedigerand Nivîskar **Evdile koçer** di gotara **D.R (11)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de